

Rapora Mehane ya Kuştîyên li Sûriyayê

Cotmeh 2019

Statîstîkên Giştî




Hejmara Qurbanîyan ji nîvê adara 2011an ve

Navenda Bibelgekirina Binpêkirinan ji
nîvê adara 2011an heta dawîya **Cotmeh
2019an**, kuştina **194,506** kesên li
Sûrîyayê bibelge kiriye


● **125,312 (64.43%)**
welatîyên sivîl in

● **69,194 (35.57%)**
ne welatîyên sivîl in




Kuşti li gor aliyê kujer

Kesên berpîrs di ber hejmara herî mezin a kuştîyan de (yên sivîl û ne sivîl) ji nîvê adara 2011an heta **Cotmeh 2019an**



Kesên berpîrs di ber Kuştîyên Sivîl de ji nîvê adara 2011an heta **Cotmeh 2018an**



Cotmeh 2019 Statîstîkên




1. hejmara kuştîyên ji ber şeran

Navenda Bibelgekirina Binpêkirina di **Cotmeh 2019an de**, **620** kuştî li seranserî Sûrîyayê bibelge kir. **554** ji nav wan bi navên xwe hatin bibelgekirin û **66** yên din weke kesên nenas hatin bibelgekirin.

2. Kuştî li Gor parêzgehê


Hejmara herî mezin a kuştîyan li parêzgeha Heseke bû, Navenda Bibelgekirina Binpêkirina **190** nav bi belge kir, piştî Reqa **89** kes, paşê Êdlib **76** kes û **265**ên din ji parêzgehên Sûrîyayî yên din in.



● Heseke ● Reqa ● Êdlib ● Yên din

3. Kuştî li Gor Beşan (Sivîl û Ne sivîl)


Hejmara kuştîyên sivîl **264** kes in û yên ne sivîl **356** kes in



● Sivîl ● Ne sivîl


4. Kuştî li Gor Sedema Mirinê

Hejmara kesên ku ji ber guleyan hatin kuştin **400** kes in, bombebaran û bermîlên teqîner bûn sedema kuştina **43** kesan. Hejmara kesên ku ji ber hawin û tankan hatin kuştin **76** kes in û **23** kes hatin îşkencekirin û ji ber wê di girtîgehên Hikûmeta Sûrîyayî de hatin kuştin, ji alîyekî din ve **62** kes ji ber tirimbêlên bombekirî û mayînan hatin kuştin û **11** ji hêla alîyên nenas ve hatin revandin. **0** kes ji ber dorpêçê hatine kuştin û **0** ji ber kilorê. **5** kes ji ber sedemên din hatin kuştin.



5. Kuştî li Gor Zayendî

Hejmara kuştîyên nêr ku temenên wan bêhtirî hêjde salan e **543** ye û yên zarok **24** in.
Hejmara kuştîyên jin **50** ye û yên zarok **3** bû.



6. Kuştîyên ser destê Dewleta Îslamî

Navenda Bibelgekirina Binpêkirina li Sûrîyayê kuştina **15** kesan li ser destê Rêxistina Dewleta Îslamî li Îraq û Şamê –DAIŞ, bibelgekir. **3** kuştî welatîyên sivîl bûn û **12** ne sivîl bûn.



Hejmarên di vê raporê de xwe dispêrin Navenda Bibelgekirina Binpêkirinan. Ew ne hejmarên dawî ne û rastî guhertin û rastkirinê ji hêla birêveberên Navenda Bibelgekirina Binpêkirina û Tîma Bibelgekirina Mîdanî.

Her raporek hejmarekê pêşkêş dike û hejmara rast di rapora dawî de ye. Em spasdarên endamên tîma bibelgekirinê ya meydanî ne ku rojane dikevin metirsîyê de da ku binpêkirinên mafên mirovan li Sûrîyayê bibelge dikin û belvaokên navendê bêyî xebata wan nedihatî weşandin.



مركز توثيق الانتهاكات في سوريا
Violations Documentation Center in Syria

www.vdc-sy.net

Eger têbînî an pirsên wan hebin, bi rêya vê emailê bi me re têkildar bin:
inquiry@vdc-sy.info

Bo dîtina raporên me yê berê bi zimanê erebî
[/http://vdc-sy.net/category/reports_ar/monthly_reports_ar](http://vdc-sy.net/category/reports_ar/monthly_reports_ar)

Bo dîtina raporên me yê berê bi zimanê îngilîzî
[/http://vdc-sy.net/category/reports/monthly_reports](http://vdc-sy.net/category/reports/monthly_reports)